# Quarantine information

Ev agahdarî ji we re hat şandin ji ber ku ji we re û/an jî ji malbata we re ji hêla Dezgeha Tendurustiyê ve name (ferman) hatiye şandin ku hûn di bin karantînaya malê de bicîh bibin.

**Ev tevdîr ji bo çi tê girtin?**

Sedemeke berbiçav heye ku bê gumankirin hûn û/an jî hin kesên li nav malbata we ji vîrusa korona ya nû bibandor bûbin.

Dezgeha Tendurustiyê biryar daye ku we têxîne bin karantînaya malê ya mecbûrî ku pêşî li berbelavbûna enfeksîyonê li kesên din bigire.

Ev vîrus dibe ku ji bo hinek mirovan gelekî xeternak be, bitaybetî jî ji bo mirovên kal û mirovên ku di şert û mercên pişîjkiyê de ne an jî yên xwedî sîstemeke parastinê ya zihîf in.

**Karantîna tê çi wateyê?**

Karantîna tê vê wateyê ku ji we re destûr nayê dayîn hûn cihê xwe biterikînin, heta destûr nayê dayîn ku hûn derkevin derve ji bo meşê an jî ji bo dayîn-standinê.

Divê hûn li odeya xwe ronên. Hûn nikarin tevlî çalakiyên dema xwe ya vala jî bibin.

**Divê ez heta kengî di bin karantînayê de bimînim?**

Karantînakirina we dê nêzê du hefteyan berdewam bike. Dezgeha Tendurustiyê dê bidawîbûna demê diyar bike.

**Gelo destûr heye ji bo min ku ez ji odeya xwe derkevim?**

Na. Tenê hûn dikarin ji bo bikaranîna hemama ku li korîdorê ye ji odeya xwe derkevin.

**Divê ez çawa tev bigerim?**

Destê xwe gelek caran bişon û eger ji poza we dilop tên bi desmalê paqij bikin.

Eger di odeya we de mirovekî/e dinê an jî kesên din hene, xwe ji wan dûr bigirin û têkiliya fîzîkî bi wan re daneynin.

**Ev ji bo malbat/hevalên min tê çi wateyê?**

Hûn dikarin bi rêya telefonên destan bi hevalên xwe re û bi malbata xwe re ku bi we re di heman odeyê de ninin têkiliya xwe berdewam bikin.

**Ez dê çawa xwarinên xwe bigirim?**

Xebatkar dê xwarinên we bînin odeya we. Li kantînê ji we re destûr tune.

**Eger ez xwe nexweş hîs bikim divê ez çi bikim?**

Dê xebatkar bi hawayekî binîzam rewşa we ya tendurustiyê kontrol bikin.

Eger pêwistiya we bi arîkariya pişîjkî heye hinekan agahdir bikin. Pişîjk dê were we di odeya we de bibîne.